Raport

# Raporta civîna salane ya Navenda Firatê ya Lêkolînan

Ev raporta sîyasî, nêrîna Navenda Firatê ya Lêkolînan di derbarê bûyer û geşedanên sîyasî yên sala 2023`an de ye.

Di 24`ê berfanbara 2023`an de, Navenda Firatê ya Lêkolînan, bi amadebûna tevaya endamên beşên navendê, civîna xwe ya salane li dar xist. Di civînê de, tevaya geşedanên sîyasî yên li ser asta herêmî û navdewletî hatin nirxandin û dahûrandin, nemaze rewşa alî û hêzên ku bandora wan li dosyaya sûrî heye, her wekî Amerîka, Rûsya, Îran û Tirkîya. Her wiha bandora wan geşedanan li rewşa xwecihî ya herêmî, li rex nirxandina dosyaya terorê.

**1- Ji hêla Navdewletî ve:**

Di sala 2023`an de, gelek bûyer û guhertin li ser asta navdewletî çêbûn, û li herêmên germ ên berê (şerê Rûsya û Ukrayîna), herêmin germ ên dîtir zêde bûn, weke şerê Qerebax-Azerbaycan, şerê li Sûdanê, û vê dawîyê jî şerê li Xezayê. Ev hemû li rex şer û rageşîya berdewam li Sûrîyayê. îcarê dîyar e ku şerê hêzên cîhanî yên hegemon û hêzên nûhatî dê dirêj bike. Û eger em bala xwe bidin nexşeya van şeran, em ê bibînin ku ji alîyekî ve hemû li dora çavkanîyên gaz û parastina wan digerin, û ji alîyekî din ve ji bo desteserkirina rêyên bazirganîyê yên bejahî û deryayî. Her hêzek ji wan hêzan xwedî berjewendîyên cihêreng û dijber e, çimkî –wek nimûne- "korîdora aborî ya hindî" dijberî "projeya kember û rêya çînî" bû, û her alîyek astengîyan li pêşîya projeya alîyê dijberî xwe derdixe, ev yek jî rewşeke nearam û tevlihevîyekê bi xwe re tîne. Û ji ber ku li  Rojhilata Navîn ew rê û xet rastî hev tên, bê guman wê Rojhilata Navîn jî di nava şerê wan de be.

**2- Rewşa Rûsyayê:**

Çaverê ye ku di sala 2024`an de, hilbijartinên serokatîyê encam bidin, û ji bo vê yekê, Encûmena Bilind a Federal dema serokatîyê ji 4 salan kire 6 sal, ev yek dihêle ku êdî Pûtin heta sala 2036`an li ser hukimê Rûsyayê bimîne.

Hemû astengî û alozîyên ku di sala 2023`an de li Rûsyayê rû dan di encama şerê wê yê li dijî Ukrayînayê de bûn, ew şerê ku Rûsya bi "operasyona taybet" bi nav dike, û vê têgihê li tevaya dezghên ragihnadinê ferz dike, û çi kesê vê wê red bike, ew dê were cezakirin û zindankirin, ew jî da ku neyê xuyakirin ku va ye Rûsya di şerekî domdirêj de noq bûye û heta niha nikare bi ser bikeve, her wiha da ku bide xuyakirin ku heta niha Rûsya tevaya hêz û giranîya xwe nedaye vî şerî, û liv tevgerên wê teknîkî ne!.

Ev hemû ji bilî ku ti asoyên bidawîbûna vî şerî di wextekî nêz de hîna nexuya ne, çimkî bicihbûna leşkerî piştî 3 salan ji şer heta niha gelekî nehatine guhertin.

Vî şerî ji alîyê dîplomatîk ve jî encamên neyînî bi xwe re anî, ji ber ku Rûsya hewl da ku çarçoveya peymanên xwe yên bi gelek welatan re bi tevgereke mêkokî berfireh bike, lê encamên ku tê xwestin ji hikûmeta Rûsyayê re neanîn, ji ber ku nikarîbû dorpêça li ser xwe rake. û heta Çîn jî, ku hevalbenda Rûsyayê tê dîtin jî, sûdê ji dorpêça li ser Rûsyayê dibîne, bi erzanî kelûpelan ji Rûsyayê tîne û kelûpelên xwe bi buhayekî bilind ji Rûsyayê re dişîne. Lê dîsan jî Rûsya hewl da ku ji damezrandina "Koma BRICS" sûdê werbigire, da ku valahîya aborî tijî bike û madenên ku ji erdên xwe derdixe bifroşe, û di sala 2023an de hewl da ku vê dosyaya aborî bi tevlêkirina welatên nû berfireh bike.

Her wiha balkêş e ku di sala 2023an de, rol û karîgerîya Rûsya li Sûrîyayê kêm bûye, û ti gavên pratîkî ji bilî girtina çavên xwe ji ser êrîşên Îranê yên li ser baregehên Koalîsyona Navdewletî neavêt, û ev yek bixwe binpêkirina rêkeftinên di navbera wê û Koalîsyonê de ye. Koalîsyona ku banga şerê komên terorîst dike.

Ji hêla hundirîn ve, Rûsya lêçûna xwe ya leşkerî duqat kir, û vê yekê kêmbûna asta jîyanî ya ferd bi xwe re anî, û dê bihêle berhmedarîya xwecihî li kêmê bikeve. Li gorî daneyên nîva yekem a sala 2023`an, lêçûna leşkerî ya rûsî 12%. Her li gorî ajansa serjimarîyan a rûsî: berhemdarîya xwecihî ya rûsî di riba yekem ji sala 2023`an bi qasî 1.9% berûpaş vegerîyaye. Îcarê, dîyar e ku di

sala nû de wê Rûsya ti guhertinan neke sîyaseta xwe, û pirr zehmet e ku ti gava berçav ber bi pêş ve bavêje.

### 3- Rewşa Îranê:

Li Îranê gelek bûyerên girîng di sala 2023`an de rû dan, belkî ya herî berçav jî tebeserîya li dijî xwepêşandanên gelêrî yên bi ser şoreşa "Jin, jîyan, azadî" ve bû. Tevî ku hîna jî agirê wan xwepêşandan venemirîye, lê rejîma îranî dikarî hin bajar û bajarokên ku nemabû ji destên wê herin, kontrol bike, ew jî bi rêya hemû cûreyên tebeserî û tundîyê.

Bûyeran duyem jî ku nekêmî ya navborî ye, vegera têkilîyên sûdî-îranî ku ji sala 2016an ve qutkirî bûn, ev jî helbet bi xwepêşandên li hundirî Îranê rûdayî ve girêdayî ye, ku rejîma îranî bi xeterîyê hisîya, û dît vaye Amerîka "koalîsyoneke herêmî" dide avakirin, ku Erebistana Sûdîyê alîyekî girîng ê vê koalîsyonê be, û di encamê de, bikaranîna xwepêşandanên li Îranê di ber bipêşxistina vê koalîsyonê de raweste.

Li rex wê, tevlîbûna Îranê li nav "Rêxistina Şanghayî BRICS" hewldaneke bû ji bo rûbirûbûna cezayên Amerîka û hêzên Rojavayî (Xerib), bûyereke balkêş a sala 2023`an bû.

Lê vê dawîyê, bûyereke gelekî girîng û balkêş çêbû, û rola Îranê tê de ya herî berz bû, ew jî "operasyona Tofana Eqsayê" û şerê li Xezayê bû, çimkî li gorî gelek raportan, Îranê derdora 500 endamên Hemas û Cîhada Îslamîk, berî operasyon dest pê bike, rahînan û perwerde kirin, ev yek bi serperiştîya "Pasdarên Şoreşger" a îranî bi rê ve çû, û di rahînanekê de awayên balafirên bêmakîne (Glider) hat bikaranîn, berîya ku Hemas li Xezayê bi kar bîne.

Ji armancên Îranê yên vêxistina agirê şerê Xezayê di wextekî wisa de, têkbirina prosesa asayîkirina têkilîyên di navbera Sûdîyê û Îsraîlê de yên bi sponserîya Çînê bû, ew prosesa ku derbasî qonaxeke cidî ji gotûbêjîyan bûbû. Lê armanca duyem, ew bû ku hewldanên NATO û Îsraîlê yên dorpêçkirina Îranê li herêma Kafkasîyayê bi rêya vekirina korîdoreke bejahî di navbera

Ermenistan û Azerbeycanê de ji bo veguhestina petrol û gazê bo Ewropayê hebûn, her wiha tengezarkirina Îranê û bêparhiştina wê ji roleke di vê projeyê de bû.

Bê guman, Hemas alav û serkêşa şerê Îranê yê li dijî Îsraîlê ye, Îran hewl dide niha ku şerê di navbera Hemas û Îsraîlê de bi awayekî nerasterast bi rê ve bibe, da ku barê Hemasê hindekî sivik bike û rê li ber tunekirina wê bigire, lewra em dibînin basik û komikên bi ser Îranê ve li herêmê tevdigerin, her wekî Hizbullaha libnanî li anîya bakurî Îsraîlê, û milîsên şî`î li Îraq û Sûrîyayê, û anîya Hûsîyan li Yemenê. Ev komik fişarê li Îsraîl û Amerîkayê dikin û dixwazin armanca wan a tunekirina Hemasê tevlihev bikin, lê dîsan jî ev fişar nayên wateya berfirehkirina anîya şer a li dijî Amerîka û Îsraîlê weke şerekî vekirî, lê belê ew bixwe di çarçoveya fişarên sînordar de dimînin û xwedî hêlên sor in, çimkî heta niha di nava leşkerên Amerîkayê de û di encama 100 êrîşên li dijî baregehên Kolaîlsyona Navdewletî ya bi serkêşîya Amerîkayê ti leşkerên a dawîn nehatine kuştin.

Di derbarê helwesta Amerîkayê ji sîyasetên Îranê de, Amerîka ji berfirehkirina şerê li dijî Îranê gelekî hayedar e û ne amade ye derbasî şerekî rasterast û bilêçûn û dirêj bi Îranê re bibe, her wiha naxwaze şerê li Xezayê derkeve derveyî sînorên wê, Amerîka gelekî ji hêz û bersivdayîna nejirêzê ya Îranê hayedar e. Li nik wê, rewş û derfetên navdewletî jî rê nadin Amerîka ku şerekî berfireh li dijî Îranê pêk bîne, û pêwîstîya wê bi anîyeke cîhanî û herêmî ya berfireh li dijî Îranê heye. Lewra, Amerîka niha fişraran li Îsraîlê dike ku derbasî rûbirûbûneke rasterast a li dijî Hizbullahê nebe, çimkî bi vê yekê re dibe ku rewş ji kontrolê derkeve û şerekî herêmî yê berfireh ku encamên wî nayên pêşbînkirin, rû bide.

Dîyar e Biden û Netanyahu li ser jinavbirina Hamasê li hev in. Ew jî ji ber ku sîyaseta Amerîka di ber jinavbirina çavkanîya alozîyên li Rojhilata Navîn, ber bi çareserîya ragihandina du dewletan ve diçe, ew alozîyên ku Îran ji bo berfirehkirina hegemonîya xwe bi kar tîne, lê xuya ye ku Biden û Netanyahu di derbarê qonaxa piştî Hemasê de binakok in.

Girîng e îşaret bi dest û palpişta Îranê li hundirê Amerîkayê û geşedanên bi ser ve jî, ku bi rêya lobîya îranî ye, were kirin. Di vê derbarê de, endama  Meclisa Nûneran a Amerîkayê, Claudia Tenney, projeya bi navê " Qanûna Robert Malley", şanderê amerîkî yê taybet li Îranê, ku ji ber "hevkarîya wî ya bi Îranê re" ji karê wî hat bidûrxistin, pêşkêş kir. Paşê, gelek kesên amerîkî û bi eslê xwe îranî, ku li deverên hesas ji birêveberîya Amerîkayê kar dikirin, hatin keşfkirin, her wekî Arîn Tebatebayî, alîkarê Robert Malley, û seroka ofîsa wezîrê berevanîyê yê berê li Amerîkayê. Û li gorî vî qanûnê han, wê hemû karmendên amerîkî yên bi eslê xwe îranî û têkilîyên wan bi Îranê re hene werin girtin û radestî komîteyên berpirs bên kirin.

Li ser asta navxweyî, li Îranê her diçe hejmara bidarvekirinan zêde dibe, bêhêvîbûn li dar e, û çi kesê beşdarî xwepêşandan bûye tê cezakirin, bi vê yekê rêjeya bidarvekirinan a rojane gihîştîye 3`an tenê di rojekê de, her ev yek rageşî û bêhintengîya gel jî bi xwe re tîne, nemaze ku gelek mamosteyên zanîngehan ên pispor ji karê xwe hatin bidûrxistin û li şûna wan mamosteyên kêmtecrube û nezan, lê dilsozên rejîma Komara Îslamîk hatin bicihkirin, tenê ji ber ku ew mamosteyên hatin bidûrxistin piştgirîya xwepêşandanên ciwanan kiribûn, lê tevî wê jî heta niha parêzgeha Sîstan û Belûçistan a sinî ji herêmên herî xwedî livûtevgereke zêde ya xwepêşandan in, ku heta niha rejîma îranî nekarî wan rawestîne, tevî ku pêngava binçavkirin û bidarvekirina xelkê li wir berdewam e.

Di encamê de, dîyar e ku Amerîka ber bi avakirina "hevpeymanîyên" nû li herêmê ve diçe, û li ser asayîkirina têkilîyên di navbera Sûdîyê û Îsraîlê de dixebite, û bêyî wilo dê Amerîka nikaribe armancên xwe yên stratejîk li herêmê bi cih bîne, û her wiha nikaribe di rûyê Îranê de bisekine, lê dîsan jî ev meseleyên han pêwîstîya xwe bi demê û derbaskirina astengîyên li pêşîya wan hene.

Bi her halî, dixuye ku mijara vekişîna Amerîkayê ji Sûrîyayê halê hazir nepêkan e û ne jî di bala Amerîkayê de ye, û me dît bê çawa Encûmena Rûspîyan a amerîkî berîya demekê projeya vekişîna ji

Sûrîyayê kire dengdanê û di encamê de 83% proje red kir. Her wiha berpirsekî amerîkî di vê derbarê de got: vekirina derîyê şerekî berfireh bi Îran û hevalbendên wê re, ji me re baştir e ji vekişîna ji Sûrîya û Îraqê. Lewra, zîyana ku dê Amerîka ji ber vekişîna ji herêmê bibîne, dibe ku ji zîyana ji ber şerê wê bi Îranê re mezintir be.

**4- Rewşa Tirkîyayê**

Sîyaseta Tirkîyayê li herêmê di çarçoveya du xetên sereke de dimeşe, çimkî ji dema têkçûyîna "hevpeymana Sêver"ê û jidayîkbûyîna "Lozan"ê li şûna wê, êdî şerê li dijî kurdan kirîye rojeva xwe û kurd ji hemû alîyên Tirkîyayê re bûne tirsek. Xeta duyem a ku em behsa wê dikin ew e ku Tirkîya dixwaze hegemonîya xwe ya ku ji dema hilweşîna împratorîya Osmanî ve ji dest daye, bi rêya "Osmanîya Nû" careke din vegerîne, û êdî hewl dide bibe ji welatên herî girîng ên herêmê, lewra destwerdanê li gelek welatên ku "Bihara Erebî" li wan encam daye, dike. Helbet ev hewldana wê ya destwerdanê jî bi rêya piştgirîya "Îslama sîyasî" ye.

Lê tevî ewqas guhertinên ji hêla navdewletî ve, gelo niha Tirrkîya li kuderê ye û rola xwe çi ye?

Dîyar e niha Tirkîyaya ku her xwe bi cihê xwe yê jîosîyasî li herêmê didît, êdî ji derveyî gelek proje, û belkê hevpeymanên nû, li herêmê maye, her ku Tirkîya dixwaze bi rola navbeyînkar di hemû alozî û qeyranên navdewletî de bilîze, ji şerê Ukrayînayê bigire heta di şerê Xezayê ve derkeve, lê dîsan jî tevgera diplomatîk a hêzên hegemon rola wê di van geşedan û bûyeran de paşguh dike, û ji alîyekî din ve dîplomasîya Tirkîyayê bixwe êşa paşguhkirinê dikêşe, çimkî di hemû têkilîyên diplomatîk ên girêdayî şer û qeyranên li Ukrayîna û Xezayê de ti roleka Tirkîyayê ya liberçav tune bû, lewra û di encama paşguhkirina diplomatîk a ku Tirkîya dijîye, Erdogan fişar û şantajên sîyasî bikar tîne, da ku cihê Tirkîyayê jî di bazarên navdewletî de hebe, her weke bikaranîna kaxeza tevlîbûna Swêd û Fînlandîyayê bû NATOyê, û nermîya axaftinên wî yên li dijî Îsraîlê, di derbarê şerê Xezayê de,

ku tenê gotin û axaftinên xwe arasteyî Netanyahu dikirin ne ku li dijî Îsraîl weke dewlet, ew jî ji ber Tirkîya naxwaze têkilîyên xwe bi Îsraîlê re qut bike, cihûyên cîhanê li dijî xwe sor bike, û da ku bibêje va ye ez ne antîsemîtî me (dijberê Cihûtîyê).

Ji alîyekî din ve, ji ber têkilîyên Tirkîyayê yên xurt bi Îranê re, û piştgirîya wê ji Hemasê re, nemaze piştî şerê Xezayê, êdî hêzên hegemon li ser paşguhkirin û bitenêhiştina Tirkîyayê birijd in, û di encamê de vê yekê hişt ku Tirkîya pêwarîya "heval-dijminan" bi xwe ji dest bide.

Li milekê din, niha xala herî lawaz a Tirkîyayê di alîyê wê yê leşkerî de ye, çimkî ew êşa lawazîya karînên xwe yên leşkerî dikêşe, nemaze çekên esmanî, û pêwîstîya wê bi nûkirin û kirîna balafirên şer ên (F-16) heye, lê xuya ye Amerîka bi hinceta ku Tirkîya dê li dijî welatên hawîrdor bi taybet Yûnanistan, bikar bîne, nafiroşîyê, û eger em bala xwe bidine serdana herî dawîn a Erdogan bo Yûnanistanê di 7`ê berfanbara borî de, em ê bibînin ku ew serdan tenê ji bo razîkirina Yûnanistanê bû û da ku ya dawîn bihêle Amerîka wan balafiran bifroşe Tirkîyayê.

Di dawîyê de, dixuye ku metirsîyên Tirkîyayê her li dora çêbûna guhertinên nû li herêmê digerin, ji ber ku Tirkîya xweş dizane ku çi guheritnek çêbibe dê li dijî berjewendîyên wê yên li herêmê bin, û di serî de li Sûrîyayê.

### 5- Rewşa Sûrîyayê

Ji nîvê duyem ê sala 2023`an ve, Sûrîya di rewşeke sîyasî ya xetimî de maye, ew jî ji ber rawestîna danûstandinên "Astana"yê, bibinketina gerên avakirina Komîteyeke Destûrî, û neavêtina rejîma sûrî ti gavên cidî ber bi çareserîya sîyasî ve, nemaze piştî vegera rejîmê bo Komkara erebî. Lê ya ku hişt alozîya sûrî bêhtir tevlihev û paşguh bimîne, şerê Xezayê û karvedanên wê li ser Sûrîyayê bû, helbet ev yek dê berdewamîya xetimîna siyasî, herî kêm heta nîvê yekem ji sala 2024`an, bi xwe re bîne.

Bê guman, xetimîna sîyasî li Sûrîyayê, bibinketina prosesa asayîkirina têkilîyên di navbera Şam û Enqereyê de, û

berdewamîya êrîşên a dawîn li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê, di nava bêdengîyeke hêzên garantorên agirbestê de, her wiha bilindbûna asta şer li rojavayê bakurê Sûrîyayê nîşaneyên vegera şer li tevaya herêmên germ ên Sûrîyayê di sala nû de ne.

Lê dibe ku karvedanên amadekarîyên Amerîkayê di sala nû de ji bo hilbijaritnên serokatîyê yên amerîkî û hewldana rêgirtina li ber berfirehbûna şer li Rojhilata Navîn li ser dosyaya alozîya sûrî hebin, û bihêlin gotûbêjîyên di derbarê çareserîya sîyasî de bimînin heta piştî hilbijartinan.

Li herêmên Rêveberîya Xweser, li bakur û rojhilatê Sûrîyayê gelek nîşan hene ku wê di sala 2024’an de di asta birêveberî û sîyasî de gelek guhertinan çêbibin, ew jî di çarçoveya bihêzkirina cihê Rêveberîya Xweser li ser asta herêmî û navdewletî, û ji bo bidestxistina rewatîya sîyasî wek beşek ji opozîsyona sûrî.

Tevaya guhertinên sîyasî û birêveberî li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê, her wiha zêdebûna êrîş û gefên milîsên bi ser Îranê ve li dijî baregehên Amerîkayê, û zêdekirina Koalîsyona navdewletî ji rahînanên xwe yên hevbeş bi QSD`ê re, nîşaneya wê yekê ne ku êdî Washingtonê dê ji nû ve nexşeya hêzên desthilatdar li Sûrîyayê xêz bike, û dê bibin mîna kaxezeke fişarê li dijî rejîma sûrî û hevalbendên wê, da ku neçar bibe berê xwe bide çareserîyeke sîyasî sûrî, ku gelê Sûrîyayê li benda wê ye.

Lê dîsan jî, dewleta Tirk hewl dide bi rêya zêdekirina êrîşên xwe, yên bi balafirên şer û yên bêmirov li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê, û armancgirtina binesazî, seresazî û projeyên aborî, tevaya hewldanên Rêveberîya Xweser ên peydakirin û parastina aramî û ewlekarîya li herêmê vala derxe û ji nav bibe, çimkî serokkomarê Tirkîyayê, Erdogan, mijûlbûna cîhanê bi şerê Xezayê û rageşîyên li Derîyaya Sor keysbaz û bikar tîne, da ku şerê xwe yê li dijî herêmên Rêveberîya Xweser berfireh bike, ev yek helbet dê rageşî û xeterîyên ewlekarî, û zêdebûna çalakîya şaneyên DAIŞ`ê bi xwe re bîne.

Di vê derbarê de, ajansa North Press`ê di raporteke xwe de dîyar dike ku di nav de deverên sivîl, 48 deverên binesazî û jîyanî, û 21

dever li nav erdên çandinîyê, 632 dever li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê ji hêla balafirên şer ên Tirkîyayê ve, di sala 2023`an de, hatine bombebarankirin û armancgirtin.

**6- Dosyaya Terorê**

Dosyaya terorê ji dosyayên herî bigirêk û tevlihev e; ji ber ku bi gelek mijar û meseleyên din ve girêdayî ye, her wekî dîrok, ol, fikir, çand, demokratî û maf. Lê halê hazir, meseleya herî girîng li dora vê pirsa han digere, gelo ew gengaz e DAIŞ careke din xwe komîserhev bike, vegere û destê xwe deyîne ser herêmine bakur û rojhilatê Sûrîyayê?

Gelek faktor û nîşaneyên gengazîya jinûve-vegera DAIŞ`ê hene, nemaze rewşa navdewletî, herêmî û xwecihî, ku êdî jîngeheke guncaw a vejîna DAIŞ`ê ye, û ev rewşa han di berjewendîyên wê de ne.

Di destpêkê de, jinavbirina "Xîlafeta" DAIŞ`ê nayê wateya bidawîbûna wê, ji ber ku DAIŞ`ê gelek mesele û dosyayên ku pêwîstîya wan bi hevkarîyeke navdewletî û xwecihî ji bo çareserkirineke domdar û bihêz heye, li pey xwe hiştin. Ev mesele û dosyayên em behsa wan dikin girêdayî jin û zarokên DAIŞ`ê yên li kamp û navendên rehabîlîtasyonê ne, û her wiha çekdarên DAIŞ`ê yên berê ku niha li girtîgehan in, û dosyaya dawîn jî girêdayî şaneyên DAIŞ`ê yên veşartî ye ku li herêmên Sûrîya û Îraqî berbelav in û her li dijî QSD, hêzên rejîma sûrî û artêşa Îraqê çalakî û êrîşan pêk tînin. Ev hebûna liberçav a paşmahîyên DAIŞ`ê, ku em dikarin wê bi "Sêtika vejîna DAIŞ"ê bi nav bikin, piştrast dike ku ev rêxistin weke koikeke terorîst hîna li ser lingê xwe ye û li hêvîya derfet û demeke guncaw e da ku careke din "Xîlafeta" xwe ragihîne, ev hemû ji bilî rewşa navdewletî, herêmî û xwecihî ya guncaw ji vegera wê re.

Li ser asta navdewletî, dewletên mezin û sereke bi hin mijar û dozên din ve mijûl in, ku vê yekê hiştîye dosyaya sûrî paşguh bibe, û di nav de jî dosyaya DAIŞ`ê. Ev mijarên em behsa wan dikin, weke şerê Ukrayîna-Rûsya û şer û nakokîyên di navbar wan dewletên mezin di derbarê hin dosyayên girêdayî mijarine din de,

her wekî meseleya korîdorên aborî (Rêya Hevirmişê ji alîyekî ve, û rêya Biharatan ji alîyekî dîtir ve).

Li ser asta herêmî jî, şerê Xezayê piştî "Tofana Eqsayê" û karvedanên wê li meydana sûrî, nemaze êrîşên li dijî baregehên leşkerî yên amerîkî li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê û Îraqê ji hêla Îranê û baskên wê ve, ku bandoreke mezin li ser têkoşîna li dijî terorê dikin. Ev ji bilî êrîş û derbên li pey hev yên dewleta Tirk li ser binesazî û faktorên aramîyê li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê. Li alîyekî din û li ser asta herêmî, meseleya hewldanên derxistina fitineyan di navbera pêkhate û neteweyên li herêmê de, da ku wan berdine hev û rageşî û nearamî, bi taybet li herêmên Dêra Zor û Reqayê, serwer bin.

Li gorî tişta me li jorê gotî, û ji ber derengmayîna çareserkirina kirîza sûrî, tirsa vegera DAIŞ`ê weke "Xîlafet" û destdanîna li ser hin herêman her heye. Ji ber ku berî niha çêbûye, û eger em dîroka derketina DAIŞ`ê û bipêşketina wê li ber çavan bistînin, em ê bibînin bê çawa di dema kuştina Ebû Mis`eb El-Zerqawî de, serkirdeyê El-Qa`îdayê li Îraqê, ew rêxistin bi dawî nebû, û careke din xwe komîserhev kir û vegerîya, ew jî di encama tevlihevî û nearamîya piştî pûyerên "Bihara Erebî".

***

**Hemû mafên belavkirinê ji Navenda Firatê ya Lêkolînan re parastî ne 2024©**

Navenda Firatê ya Lêkolînan

**Sazîyeke lêkolînan a serbixwe ye, giranîyê dide mesele û dozên sîyasî, aborî û fikirî yên girêdayî herêma Rojhilata Navîn û Sûrîyayê bi giştî, û herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê bi taybet.**